Newroz Hejmar(64) Rûpel (8) Çirya pêşîn 2005z – 2617k

Tenê bila bêjin:
Vaye em hene, hîn nemirine!!!

Dêrsim Elî

Îsal 2005 an, belavoka Newroz dehsaliya xwe derbas kir. Gava berî deh salan, me li hevalên xwe yên di serokatiya partiya xwe Yekîtî zor kir, da biryara biderxistina belavokeke bi zimanê Kurdî bistînin, çend armancên me hebûn. **Yek**: Tu belavok-rojname bi zimanê Kurdî der ne diketin, lewre me got emê bibin rêber û zêngil bi ustu bisîkê xin. **Didu**: Di serê me de bû, ew rojname xwendevan û nivîskarên zimanê Kurdî pir û jîrtir bike, zemîneke xwendekarî û fêrkirinê li ba xortan, nemaze hevalên me ava bike. Hêviya me pir bilind bû, ji ber ku, armanc jî hêja û bilind bûn.

Roja îro, piştî deh salan, zor pêwîste em li xwe vegerin, ji xwe pipirsin, kanî me ji wan armancan çi pêkhanîn ?

Bi ya min be, armanca yekê ta radekê pêk hat. Ji ber ku çend mihe ne çûn, belavokeke din binavê **Deng** biderket û ew jî ra niha berdewam dike. Lê belê di hêla pirkirin û çakirina xwendevan û nivîskaran, mixabin em bi ser neketin. Gava Newroz nû bû, xwendevanên wê hebûn, ew dixwastin, dixwendin û tê de dinivîsandin. Lê bi demê re jimara wan kêm bû, xwestek li ser Newrozê jî kêm bû û her çû çarçew teng bû. Yanê, digel ku tu serjimar li ba me nînin, lê diyar e ku em di vî warî de bi şûnd e çûne. Me nikanî xwe pêşd e bida. Li hêla din, me rê neda kesine din da şûna me bigrin û şopê bajon. Ez kanim bêjim, ta radekê, em, desteya birêvebirina Newrozê, di riya rojnama xwe de bûne kelem û asteng. Lewre jî gerek em rojekê pêşd e li xwe vegerin, rewşa rojnama xwe binirxînin û rê bidin bilî xwe. Belkî nifşekî nû kanibe xemleke nû li Newrozê bike û xwîneke teze pê de berde. Eger ji bo tenê em bêjin : Vaye piştî deh salan hîn em hene, nemirine! Em netenê dibin kelem, Newroza xwe jî perîşan dikin, rewşa zimanê Kurdî jî bi xwe re lawaz dikin. Ev jî berpirsiyariyeke giran e, em tev di ber de berpirsyar in. Mirov kane ta radekê bide, bixebite, tiştên nûjen û sûdar bafrîne, lê digihê radekê, eger mirov xwe têr û nû neke, kaniya afirînê ziha dibe, dimiçiqe, berhem lawaz dibin. Eger em rast bendewarê zimanê xwe yê şêrîn in û Newroza me li ber dilê me buha ye, gerek desteya birêkxistina Newrozê istîfa bike, daku hevaline nû tê de cih bigrin. Gava em serastkirin û nûjenkirinê dixwazin, gerekî berî em ji xwe de dest pê bikin. Di hin mejiyan de keysebaziyê lenger berdane, derdoran jehrikî dikin. Ew jî, bi bilî birînkarî û kewandinê derman nabe. Lê bila em şaş tênegihên, zor pêwîste her nivîskarek, xwendevanek, rewşenbîrek li kêleka Newroza xwe bisekine, pesena wê bike. Ziman zimanê me ye û Newroz zaroka me ye. 14-9-2005